

# ZANYARÎYA JI BO NEXWEŞÎ Gabapentin Actavis

Ji bo dermankirina atîyê

## ! Zanyarîya giring!

Di bikaranîna Gabapentin Actavis-ê de bi taybetî hay ji van hebin:

- eger gurçikên te têrî te nakin/nexweşin di wan de hebe
- eger tu di hemodiyalizê de bî û êşa masûlkeyan an bêhêzîya avahîya masûlkeyan di serê te de buhurîbe serî li dixtorê xwe bide.
- eger di serê te de êşa daîmî ya mîdeyê buhurîbe, dilê te li hev bikeve û tu vereşî zû zûka serî li dixtorê xwe bide.

## Gabapentin Actavis divê çawa were bikaranîn

Her car Gabapentin Actavis-ê li gora dixtor ji we re gotiye bistînin. Eger tu qenc nizanibî, divê tu li şîreta dixtorê xwe an jî xebatkarê dermanxaneyê xwe guhdarî bikî. Dermankirin, di rewşa asa de bi doza kêmtir dest pê dibe û paşê derce bi derce tê betirkirin. Ji bo têgihîştina doza herî baş a ji bo te dibe ku hinek zeman bivê. Hebên Gabapentin Actavis-ê divên bi aveka pirr werin daqurtandin. Heban necû. Gabapentin Actavis dibe bi xwarinê an bêyî xwarinê were standin.

Her car hemîyê doza ku ji aliyê dixtorê te ve hatiye xuyandin bi kar bîne. Tu car perçeyekî hebê nestîne.



## Divê dermankirin çî qas zeman dewam bike?


Dê dixtorê te biryar bide ka dê dermankirina te çî qas zeman dewam bike. Gelek giring e ku tu bêyî têkilîkirina dixtorê xwe dermankirina xwe ranewestî. Ji nişka ve rawestandina dermankirina bi Gabapentin Actavis dibe bibe sebebê xetera bêtirbûna çendîn felcan. Eger ku ji ber çî sebebê dermankirina te hat rawestandî, doz, wekî ku di reçeteyê ku te ji dixtorê xwe wergirtî de jî hatiye xuyandin divê derce bi derce were kêmkirin.

## Eger ku ez ji Gabapentin Actavis-ê gelek bixwim divê ez çî bikim?

Eger te Gabapentin Actavis-ê zêde daqurtandibe, an zarokek bi şaşî ji dermanê standibe, divê tu bi lez ji bo nixandina xeteran û şîretan serî li dixtorêkî, karkerekî nexweşxaneyê an karkerekî dermanxaneyê an jî Poison Information Centre (Navenda Zanyarîya Bijehrêketinê) (pê li 112ê bike) bidî.

## Eger ku ez standina dermanê xwe ji bîr bikim divê ez çî bikim?

Ji bo telafîkirina doza jibîrkirî, hebên zêde nexwe. Eger te standina dermanê xwe ji bîr kir, ji dixtorê xwe awayê dewamkirinê bipirse. Dema çûyîna di ser doza te ya paşin de gelek giring e.



## ZANYARÎYA JI BO NEXWEŞÎ

# Gabapentin Actavis

Ji bo dermankirina atîyê

## Bandorên kêlekî yên gelek tên dîtin çi ne?

Wek dermanên din, Gabapentin Actavis jî dibe bibe sebebê bandorên kêlekî, lê her kesek mûheqqeq jê janê nakişîne. Bandorên kêlekî yên “gelekdtî” û ji 10 nexweşan bi 11 re dîtî tevî weşîna çermî, êşa serî, gêjbûn, xewokîbûn an tevîzîn, kêmketina ji tevgerê an xumambûna dîtinê ye. Ev bandorên kêlekî gelekê caran karin bi awayê car bi car bêtir kirina dermanan werin astengkirin.

Li ser bandorên kêlekî zanyariya bêtir kare di reçeteya haydarkirina nexweşî ya di pakêtê de were dîtin.

## Gelo ez karim dermanên din bistînim?

Bandora Gabapentin Actavis-ê kare biguhere û di yek zemanî de bikaranîna hin dermanên din dibe ku xetera bandora kêlekî bêtir kiribe. Lîsteya van di reçeteya zanyariya ji bo nexweşî ya di pakêtê de heye.

Eger tu çî dermanên din distîni an te di nêz de standibe, her car ji dixtorê xwe re bêje. Di nava wan de dermanên ku bêyî reçete tên firotin û dermanên Kurmancî jî hene.

## Ez karim biajonim?

Gabapentin dibe ku bibe sebebê gêjbûnê, tevîzînê û westîne. Ji ber vî awayî, divê tû wasîteyekê neajonî, mekîneyeka girift bi rê ve nebî an heta têgihîştina hebûn an nebûna bandora li ser hunerên weha, çalakîyên xeter ên potansiyel ên bi vî awayî bi rê ve nebî.



Tu ji xuyandina rewşa xwe ya tê de ya ji bo ajotina wasîteyên bimotor an kirina karên ji wan re şiyarbûna pirr divên berpirsîyar î. Tevî vî awayî, bera di bîra te de be ku dema ku bi te re nexweşîna atîyê hebe, ji bo destûra ajotina wasîteyekê divê tu di seranserê salekê de hîç bi atîyê nekevî.

## Gelo ez karim araqê vexwim?

Ji bo kesên ji atîyê bijan in, ji bilî pêşniyariyeka tevahî ya li ser vexwarina araqê zêde, hîç tixûbkirineka taybet tune ye.

## Bihemlbûn û mijandin

Heta dixtor nebêje divê tu di seransera hemlê de Gabapentin Actavis-ê bi kar neynî. Hîç lêkolîneka mûheqqeq li ser ji alîyê jinên biheml ve bikaranîna gabapentin-ê tune ne, lê ew hatine danzanîn ku dermanên din ên atîyê dibin encama bêtirbûna zirardîtina fetusê-cenînê, bi taybetî jî dema ku çend cûr derman di yek zemanî de bi kar werin. Ji ber vî yekê, di jinên nexweşên atîyê de heml, divê bi awayê ku dermanên wan werin birêvebirin û xetera xerabûnê were kêmkirin were birêxistin.



Gabapentin Actavis bi şîrê çîçîkê-memikê re tê avêtin. Bandora wê ya li ser mijandina bebekan nayê zanîn. Tevî vî awayî, divê tu her car berêya di dema mijandinê de bikaranîna Gabapentin Actavis-ê bi dixtorêkî re têkilî bikî.



.....

.....

.....

.....

